Term di hozana malavahî ya Elhoî da



Helbest: Şemal Akreyî
Xwendin: Azad Dartaş

Malavahî ya elhwî
Sema, xewn, havî bûn,
Sê pêka tejî kenî û rundik û?
Niha demê dwîr keftinê ye
Da nivêjeka dî berf jêhel
Li sêdarê bideyn
Taku subehî û
Ew ruja dwîv da
Hindek şîrînî yê
Bikene baran,
Me dinav perên pencerên tarî da
Seqa biken,
Entîkxana ji mesil biken!
Ax!
Bu wî agirê diwê jura teng da,
Demê kuxîn û
Pişt xwîkî ya pîrejinan...
Eviran wekî seyên har,
Li bazarên dîla difiruşin û
Bi wê mija pîvazî bay disimin
Me dikene...
Sengerekê herftî,
Behî darên zîndî ya...
Bi sema dêxin,
Uz Namînim ez
Tu jî her befirî!
Ha... Eve...

Çavên elhwî,
Ji vexarina xuzî yan
Hêşta digêjin.
Eve ne semaye
Berê min negurre...
Ji wergirtina padaştên şkestinê,
Careka dî...
Ji nedîtina terra ((çirîw))!
Givaştin û kela hezê
Em digehandîn stêra
Du parçeyî ya xu me dibuhujand
Ew gilupê li hindavê mejî
Dihat û diçû
Were bu te bi bêjim:
Ew rêka...
Min û te evru pêk ve
Bê î te... Birrî,
Hemî xazgînî yên te
Dikirine mîhivanên min!
Ez dibûme zarûyekê day berze
Digehiştmete û...
Tu mijeka bê reng
Sîbera tejî
Geleka bê uxtubar bû
Runidkên min
Ne dikarên bihejînin,
Bila dilê te bitinê...
Nermî ya êk tibla te heba
Daku li ruja mal avahî yê
Çavên min
Dibîyava bînahî yê da
Wekî min
Biban term
Hulnda 5/4/1998

Şemal Akreyî

Pêşinîyar: Peymanek di navbera dil û tibla bihête bestin û (dil) nermiyê ji tibla werbigirît...

Term: Yan xuvekêşan, qayil bûn bi cihê bînerê yan pirsîyareka vekirî daxaza destpêkeka nwî jibu cihînana ew meremên wî bawerî pê hey

û neşîya bicih bînît, lêre term yê hev dije digel mirinê û neyê rwîse ji ezmuna, ev terme ewê daxaza buhjtina hevdijan dinav sî̆pêkê dakirî yê li dwîv nasnama xwe digerêt, yê li dwîv ramana hebûnê wibhayê nehebûnê digerêt, pêşinîyar e bu pesendkirina peywendîyeka nwî piştî pirus helweşandinê bi dumahî têtin û ev peywendîya nwî bête avakirin liser bineretê mafê hebûna cîyawazyê.
Ev terme jilayê derunî ve yê saxe, wesa tê digehim ku wî divêt li têgehên meyên çav lêker bu jîyanê, dihavîbunê û sema... Hitid derbikevît.
Ramana hebûnê bibîte pirsîyarek diqeyiranê da, lewmajî dê bînîn ku term dê bîte dîtin zêdegavî guhirîn gerîyan lidwîv tiştê nehatî, lewmajî dihuzanê da dem demekê vekirî ye.

Niha demê dîrikeftinê ye
Ev demê vekirî dê mînît bi mercê lêdana pîruzyê û pênigavên bi wêr ji bu encam dana pirusa ava kirinê û dibêjît:
Da nivêjeka dî beref jêhel... Li sêdarê bideyn
Li vêrê ev lêdane merce ji bu bi cihînana van hez û guhirîna beref asûyekê vekirî (jêhel). Lê ev lêdaneya berdewam nabît divê deqêda, çunku huzan van dê hêt sinurekî bu vê lêdanê danêt, vê pirusê û berdewam bîna wê vedigirêdet bi cihînana hinek armanca

Ta ku subehî û
Ew ruja dê didîvda
Hindek şîrînyê bikene baran

Bi ramanek dî her dema ef guhirankarî ye hatine rwîdan lêdan jî dê hête ragirtin. Li vêre careka dî dê kevîte jêr desheladarî ya hinek pîruzyên dî, yan jî diroşimên nwî.
Dîsan huzanivan sinurekê dî didanêt bu pirsa avedan kirinê li ser bineretê cîyawazyê, dema xu dikete nimûne û dibêjît

Daku li ruja mal avahyê
Çavên min
Dibîyava bînahyê da
Wekî min
Biban term
Bi vê çendê jî û her çend e term dibît rengek bît ji rengên xewna yan jî semayeka aşupî bît û havîbunek nwî bît, lê dema dibêjît (wekî min) dîyar dibît ku huzanivanî nimûnê xwyê berihev heye, çunkî xu

dikete nimûne (ezmuna xu). Bi ramaneka dî xwîndevanî pitir bi xuve mijîl diket (huzanivanî) nahêlît wergir li bîyavên dî dinav deqêda bigerêt,

Min gut nimûnê xwyê berihev heye, bi vê çendê jî dê piruseka dî ya dûbarekirinê hêt encam dan, li vêre fişara hizra desheladaryê dinav naxê her miruvekîda ya zalle li dîv dîtinên min hêş miruv neşîyaye ta dîmahîkê yê dîmukiratî bît.

Miruv li wî demî dê karêt berdewamyê bi pirsa efirandinê û helweşandinê bidet, dema çi nimûnên xu yên berihev nebin û xu bi xudanê çi deqan nezanît, ew deqa em dinivîsîn dema bi dîmahîk hat pêtivî ye miruv xu jê dwîr nêxît, bi ramaneka dî berevanyê jî neket eger zanî ku hinek hizirên dî hatine gurê... Karîger û nwîtirîn ji hizirên nivîserî ewên dinav deqa xu araste kirîn, husa karê rixneyî di gehîte astê helweşandina bê sinur, rexne ne bi tinê li wan hizran dihête kirin ewên miruv jê nerazî, belkî ew hizirên miruv jêrazî jî bêxîte baznê rexnê û gumanêda, çunkî her çewa bît hinek hizirên dî hene hêş negehiştîne miruvî pêtivî ye miruv li dîv bigerêt, û divê gerîyanê da dê li ser hizirên nwî û zêde gavî helbît, li dwîf dîtinên min husa pirusa afirindinê û nwîxwazyê dihête encam dan, û amiraz jî berêxudanên rexneyî û qayil bun bi cawazyê, çunku rexne hiceta berdewam bîna xo cawazyê werdigirît her weku dikitur malik Alimglbî dibêjît, dîsan dikitur bidalislam Alimirsdî dibêjît: Cawazî pirsîyara peyda diket û deq dê mînît bi cîyawazyê pirsîyarek di qeyiranêda û dê ya ava kirî bît li ser dû dilyê û husa jî nivîser nabîte pabendê çi deqa yan jî xu ji deqê bilintir dibînît eger vezivirîne despêka huzanê û rista wê ya yêkê:

Sema, xewin, havîbun

Û girêdeyn di gel encamê dinexşêda dîyar (term) dê karîn vê sê guşê dirust keyin:

Berî nihu me gut daku ev lêdane ya berdewam bît pêtivî bi sê dar e dana pîruzyê ye eva lêdane hate encam da, lê ta dîmahîkê ya berdewam nebu çunkî pîruzîyek dî peyda bu.

Da runahyên xu berdeynef ser risteka dî ya huzanê ewa dibêjît

Me dinav perên pencerên tarîda

Seqa biken

Entîk xana jime sil biken!

Ax!

Bu wî agirêdwê jura teng da

Agirî pêtivî bi cihê heye, her çend e ev agirê dinav vê huzanê da cihê

wî firehtir e ji kuçkî û bu xêrê, lê her ew cih yê may çarçîv kirî (jura teng) û husa bizav û seriheldanên gelê Kurdistanê her çend e jêderên hîvî û daxazîya bun, lê her yên çar çîv kirîbun û dibîyaveka neya berfirehda livîn dikir.
Jin jî mîna wî agirî jêdera germatiyê û tenahyê û umêdaye û divê deqê da jî jin pîrejine mîna agirê çarçîvî kirî diwê jura teng da, lew ma jî peyva (ax) ya diberahîka vê ristê da hatî weku nîşanê keser û kuvanyê û pencere jî man tarî, her çend e pencere jêderê wergirtina runahyê ye û derîyek e bu dîtinê, lê dê mînît dîtineka lawaz û hîvî bi baranek dî heye ku dinav wê bêzaryê da bêne berihev kirin jibu bi cêyînana armancek mezintir (seqa biken).
Li vêre se civengên dî hevdû dirust diken pencerên tarî jura teng pîrejin ev sê hêmaye nîşanên kêm umêdyê ne lê dikarên bêjîn nîşanên bêzaryê û bê umêdyêne, çunku her çend e pencere yên tarîne, lê her dê weku jêderê runahyê û dîtinê bin, dîsan jura teng nîşanê hebuna cihî ye her çend e ciheke yê sinur kirî ye, lê bi hîvî ye ku ev jure berfireh bibît û agir ((şureş û kuhirîn)) bîyavên berfirehtirda belav bibît, û pîrejin her dê ((mê)) mînît dinîşana avzayê û tenahî û hêmyê ye, lew ma jî huzanivan dihuzana xuda xûya diket ku nihu gava lêdana pîruzîyaye û demî dwîr keftinê ye ji hemu bîr û buçunên bîne asteng yan jî bwîne egera çar çîv kirina agirî dijura teng da helbet dema ev kare tête encam dan di zincîreka bersiv û nerazîbuna digelida hev çimik bin û dibîte egera veqetîyanê digel hizir û bîrên berê, huzanivan vê çendê siruştî dibînît û dibêjît.

Entîk xana jime sil biken
Her ew entîk xanene (hêmayê bîr û buçunên neguncay digel danên serdemî yan jî ew hizirin yên çarçîv kirî) ewên bwîne egera çendîn karesata û em kirîne sengerên herftî û behî darên zîndîya mîna di huzanê da hatî.
Li dîmahîkê dê bêjim eve xundinek bu divê huzanêda û ez diwê bawerê dame ku ev huzane dê karît çendîn xundinên dî hembêz biket, çunku valatîyeka têda hey û xundevanê duwê û sîyê bît valatî ye dê bu bîte xalên despêkirinê û bi têkira dê karim bêjim cihê cudayî divê huzanêda heye.